Bi te re wekî welî rêyeka nû ya danûstendinê

Şaredariya Karlstad ji nuha û pê ve bi rengekî nû wekî welî wê bi te re danûstendinê deynê. Navê amûrê Haldor Education e û ev platformeke modern ya fêrbûna dîjîtal e. Di Haldor Education de, wek weliyekî tu dikarê fêrbûn û pêşkeftina zaroka xwe bişopînê û tevlî bibê , beşdarî nûçeyên ji dibistanê bibê û bi mamoste anjî perwerdekarê berpirsiyar re têkiliyê deynînê.

Bi Haldor Education`ê wekî welî tu dikarê:

- tiştên aktuel çine bihesanî niha bibînê, wek mîne nûçenivîs anjî plansaziyan
- meyzînê ka kîjan agahdarî ji bo zaroka te girîng û aktuel e û bê divê kengî bi şûnde werê şiyandin
- beşdarî nirxandinên zaroka xwe bibê
- rasterast ji mamosteyê zarokê anjî perwerdekarê berpirsiyar re peyaman bişînê
- nûçe, anons, plansazî û peywiran ji swêdî wergerîne zimanê zikmakî û bi dengekî bilind bide xwendin

Wiha tu dikevî yê

Du rê hene ku tu wekî welî têkevê hundir, an bi rêya App`a Haldor Förälder anjî bi rêya webxwîn/lêgerka vh.haldor.se. Tu bi e-legitimationê/e-nasnameyê dikeviyê de, wek mîne mobilt bank-id/bank-nasnameye mobîl. Ji bo te kesê ku nikaribê bi e-legitimation/e-nasnameyê têkeviyê, dikarê ji bo instruktionên/rêwerzên din bi mamosteyê şêwirmend yê zarok re têkilî deynê.

App`a ji bo weliyan

Tu li ser mobîla xwe bi App`a ”Haldor Förälder” dikarê têkevê Haldor Education/Perwerde û li ser çalakiyên ku bi zaroka te ve girêdayî kurteagahiyan bigirê. App`a mobîlê him ji bo Android û him jî iOS heye. Li "Haldorê" di App Stor anjî Google play de bigere û qeyd bikê.

Ma tu dixwazê zêdetir bizanibê?

Di Karlstad.se de tu dikarî li ser pergala dîjîtal a nû Haldor Education/Perwerde bêtir bixwînê.